birayetî

Bayram Ayaz

Edaleta Tirkan edaleta „devê tifîngê“ ye

Gotinek me ê pêşiya heye, dibêje; *„Zêr zane, zor zane, devê tifînga mor zane“*. Zêr nîşana dewlemendiyê, zor ya desthilatiyê ye. Devê tifînga mor jî qudreta çekdaran e. Her çiqasî em di çaxekî modern de dijîn û maf û edalet divê bi ser her tiştî re be, lê xuyaye îro jî li dewletên wekî Tirkiyê devê tifînga mor xwedîyê her tiştî ye! Hela dema mijar Kurd be, edalet medalet qet nayê bîra kesî!

Tiştê bi serê dawa Şemzînan û serê Sawciyê Wanê hat ev e. Generalên Tirk devê tifîngê nîşan dan! Li Şemzînan zilamên wan nava rojê û li pêş çavên xelkê çûn bombe avêtin dikana Kurdekî welatparêz. Xelkê xwe avêt nav agir û her sê provakator girtin. Hemî tişt aşkere bû. Sawciyekî ciwan xwedî wijdan dawa vekir. Çi bû? Generalan yekser „devê tifîngên xwe“ dan ser Hikûmetê, Sawcî û hêzên demokrat. Sererkaniya leşkerî nehişt li dijî generalan dawa vebe. Hikûmetê bi paşde gav avêt. Midûrê Îstixbarata Emniyetê Sabri Uzun ku îşaretî gunehkariya leşkeran kiribû, ji kar girtin. Belengazê Sawcî jî di nav dest û lepê generalan de maye! Di derheqê wî de jî tahqîqat berdewam e, dibe ku wî jî ceza bikin!

Vê bûyerê carek din rengê rejîmê nîşan da: Li Tirkiyê xwediyê gotinê hê jî general in û rejîm rejîmek leşkerî ye. Astengiya sereke li pêşiya demokrasiyê û çareseriya doza Kurdistanê ev e. Divê em li gorî vê rastiyê dost û dijminên xwe û şêweyê xebatê û tifaqan diyar bikin. Ji meha tebaxê pê de di nav ordiyê de grûba Tirkçî -Kemalîst xurttir dibe, hefsar dikeve destê Yaşar Büyükanit+Fevzî Türkeri+Ilker Başbuğ. Divê em xwe amade bikin.

Mijar gelek in, mirov pê re nagîhe gişan binivîse. Vê heftê bi kurtî çend babet.

Rojeva Tirkan niha Kerkûk e! Kurdino ha jê hebin!

Olîgarşiya Tirk vê hêlê bi pirsa Kerkûkê ve mijûl e. Tirk ji rewşa Kerkûkê dizarin, carna jî gefan dixwin, dixwazin sala bê li Kerkûkê pêşî li referandûmê bigrin. Ew dibêjin, eger Kerkûk bikeve ser Herêma Kurdistanê dê bingeha aborî ji bo Dewleta Kurdistanê peyda bibe!

Şahiya DTPê NEWROZ bû an „nevruz“ ?

Rejîma Kemalîst dixwaze hêjayîyên gelê Kurd pûç bike. Yek ji van armancên wê têkdana NEWROZê ye. Tirkan navekî nû lê kirine: Ergenekon Bayramı-Nevruz! Ev çi ye? Şahiya bê Kurdewarî, bê ala û nîşanên Kurdistanê. Di şahiya DTPê de wêneyên Barzanî, Qadî Muhemed, Şêx Saîd, Seyîd Rizo, Alîşêr, Xalid Cibran, Dr. Fuad, Mazlum, Ferhad, Egît, şehîdên Qamişlo tunebûn! Navê şahiya îsal Newroz bû. Eger em lê şiyar nebin, ditirsim sala bê bi emirnameyek îmraliyê navê NEWROZê jî bibe nevruz. Hêj wexta me heye! Min bawerî bi Kurdbûna wan sed hezaran heye, ku ew dê nehêlin Newrozê bikin nevruz!

Keç û xortên me nedin kuştin!

Ji me re dibêjin dema gerillayên pkkê tên kuştin, hûn bêdeng dimînin. Ne rast e, ev bêbextî ye. Bi salane zare zara me ye, lê goh nadin rastiyan. Em dibêjin: Bes e, keç û xortên Kurdan nedin kuştin! Bila Kurdistan zêdetir wêran nebe. Ji bo çi? Hûn dewlet, federasyon, otonomî navên! Û jibo *unîter demokratîk cumhuriyetê* jî ne hewce ye keç û xortên me canê xwe bidin.

Salman Ruşdiyekî me jî çêbû!

Nîvîskar Merwan Helepçeyî jiber pirtûka xwe bû pêneber. Alozî û zehmetiyên Kurdistana azad dizanim, belkû nikaribin M. Helepçeyî biparêzin. Lê cardin jî bi min zor e, ku Salman Ruşdiyek me Kurdan jî çêbû! Bûyerek din jî, hemwelatiyê Efxanistanê Ebdul Rahmanê misilman jiber ku dînê xwe guheriye bûye mesîhî jiyana wî ketiye ber xeterê. Ev çi hal e, çi bi serê mirovayetiyê û medeniyetê hatiye? De baş e, werin em mesihiyên bûne misilman jî hema bikujin! Ev oldariyek maqûl nîne, ev bîr û hizre fanatîzm e, rêz li jiyana insan negirtin e.

Yekîtiya Ewrûpa Kurd weke gelê diwemîn li Tirkiyê nas kir

Piştî xebateke demdirêj û bêrawestan ya ku ji aliyê dîplomatên Kurd ve hat kirin, Yekîtiya Ewrûpa bo cara yekemîn Kurd weke gelê diwemîn di organa xwe ya ragihandinê ya fermî de nas kir û bi saya Kurdan kêmnetewên din jî yên weke Qewqasî, Bosniyak û Ereb jî, hatin naskirin.

Malpera Komîsyona Ewrûpa ku organa fermî ya ragihandinê ye û agahdariyan li ser welatên berendamên YE belav dike, heta berî mehekê jî cih nedida hebûna gelê Kurd û ya kêmnetewên din li Tirkiyê. Bi tenê gelê Tirk û zimanê Tirkî nasdikir.

Ji bo serrastkirina vê neheqiyê û naskirina Kurdan ev nêzîkî du salan bû ku Hevbendiya Demokratîka Kurdên Bakur bi bêdengî li ser vê yekê karê dîplomasî dimeşand û hewl dida ku Kurd weke gelê diwemîn li Tirkiyê, ji aliyê YE ve, bêne naskirin û di malper û belgeyên fermî yên Yekîtiya Ewrûpa de cih bigirin. Di encama vê xebata demdirêj de, Yekîtiya Ewrûpa di organa xwe ya fermî de cih da hebûna gelê Kurd. Ji bo wergirtina agahdariyên berfereh yên di derbarê mijarê de me serî li nerînên Serokê Hevbendiya Demokratîk ya Kurdên Bakur Dr. Musa Kaval da. Di pêwendiyeke telefonî de Kaval da zanîn ku wan weke Hevbendî xebateke demdirêj ji bo vê guhertinê kirine, lê wan tucaran deng ji xwe dernexistiye û her bi bêdengî xebitîne. Dr. Musa Kaval dibêje, “Di vê derbarê de du konsept hebûn. Yek jê konsepta Tirkiyê bû ku digot, li Tirkiyê bi tenê Tirk hene û Kurd jî hemwelatiyên Tirkiyê yê kokkurd in. Wê dixwest vê nerînê bi Yekîtiya Ewrûpa jî bide pejirandin. Ev konsept ji bo Kurdan pir xeter bû. Ev dihate wê wateyê ku Kurd ne xwediyê tu taybetmendiyên dîrokî, çandî û zimanî ne. Ew hemwelatiyên Tirkiyê yê kokkurd in. Li gora vê konseptê tu ferq di navbera Kurdekî û mihacirekî de tune bû. Mixabin hinek aliyên Kurdan jî ev konsept pejirandibûn û Yekîtiya Ewrûpa jî bê teref mabû. Me du salan bi riya hevdîtinan, bi riya nameyan, bi riya nivîsaran li dijî vê konseptê xebat kir. Me da zanîn ku ev konsept ne di xizmeta ewlekarî û istîqrarê de ye û xeter e”. Dr. Musa Kaval dide zanîn ku wan ev yek di Beyana Parîsê de jî anîbûn ziman. Ji bo vê yekê wan gelek caran xwe gihandine Serokê Yekîtiya Ewrûpa û temamê rayedarên payebilind yên Yekîtiyê. Her wiha wan temamê Wezîrên Karûbarên Derve yên her 25 welatan agahdar kirine û gelek dostên parlamenter xistine nava hewldanê. Li gora daxuyaniya Dr. Musa Kaval temamê belgeyên vê xebatê li cem wan amade ne, lê ew nikarin belav bikin ji ber ku belavkirina wan tiştekî ne li gora isûlên dîplomasiyê ye.

Me ji Dr. Musa kaval pirs kir ka gelo Tirkiyê li beramberî vê guhertinê nerazîbûna xwe nîşan daye yan na. Bersiva Kaval bi vî rengî bû, “Heta niha tu reaksiyoneke fermî tune ye. Jixwe ew naxwazin bi awayekî fermî li dijî tiştekî wiha derkevin û naxwazin ku raya giştî ji bûyereke wiha haydar bibe. Lê bi riya wezareta xwe ya derve hinek hewldanan dikin. Ew dixwazin bi gotûbêjên li pişt perdeyan vê pirsgirêkê çareser bikin û rê li ber belavbûna wê bigrin. Lê heger ew di nava raya giştî de were gotûbêjkirin, Tirk nema dikarin rê li ber bigrin. Ji ber vê yekê girîng e ku çapemenî û ragihandina Kurdî vê guhertinê belav bike û gotûbêjê li ser veke. Divê em vê yekê têxin rojeva raya giştî ya Kurd û Ewrûpî”.

Dengê dozgeran jî dibirin

PK - Mufetîşên ku bi destûra Wezîrê Adaletê Cemîl Çiçek jibo lêpirsîna Dozgerê Komarê yê Wanê Ferhat Sarikaya hatibûn wezîfedarkirin, di 28ê mehê de lêpirsîna xwe ya li Wanê temam kirin û vegeriyan Anqerê. Mufetîş di rapora xwe de jiber du lebatên wî cezeyê disîplînê jibo dozger Sarikaya dixwazin.

Li gora raporê lebatên ku Sarikaya pê tê sucdarkirin ev in: “Di doznameyê de bicîkirina hinek taybetmendiyên ku li gora Zagona Dadgerîna Cezayê pêwîst bû nehatana bicîkirin” û “Nivîsarek ji bo Fermandariya Alaya Cendirmeyan ya Bajêr”.

Di raporê de jibo van herdû libatan li gora Zagona Dadger û Dozgeran ji Sarikaya re cezayê disîplînê tê xwestin, lê biryara cureyê cezeyê ku were dayîn ji Heyeta Bilind ya Dadger û Dozgeran re hatiye hiştin.

Li gora Zagona Dadger û Dozgeran, girêdayî naveroka sucê ku hatiye kirin, ew dikarin cezeyê “hişyarkirinê”, “şermezarkirinê” û “dûrxistina ji kar” li dadger û dozgeran bibirin.

Biryara dawî ya li ser lêpirsînê ewê Heyeta Bilind ya Dadger û Dozgeran bide.